# Rê, lez, dem û lezdanî

## Lez û lezdanî

Lez pîvana ku dibêje ka tiştek bi lez di demek diyar de çiqas dimeşe e.
Em dikarin du erebeyên ku bihevre pêşbazî dikin wek nimûne bikar bînin.Di durahîyê de her du erebe wek hev diajon.

Ji bo ku em fêr bibin ka kîjan erebe êdî zûtir diajo, û ji ber vê yekê jî serkeftî dibe divê em li leza binêrin. Ereba ku lezgîniya wî bilindtir e êdî zûtir dimeşe. Ji bo hesapkirina leza ereban, divê en bizanin ka erebe çiqas dûr çûne û çiqas dem bikara anîne. Ji bo hesabkirina leza ereban em formulek bi navê formula lez bikar tînin. Formula lez vê dibêje:

$$Lez = \frac{\text{Rê}}{\text{Dem}} \quad \text{an jî} \quad v = \frac{s}{t}$$

$$\text{fart} = \frac{vei}{tid} \quad \text{eller} \quad v = \frac{s}{t}$$

v = lez e (ji peyva velocity a înglîzî tê, û di wateya lez de ye)
s = durahîye (an jî rê ye)
t = dem e

Yekîneyên hevpar ên ji bo lez km/h og m/s e.

- - Yekîneya km / h  (h ji peyva  hour, û bi înglîzî dem e), vedibêje ka di çend saetan de çend kîlometran tiştek an kesek dur çûye.
- Yekîneya m / s vedibêje ka tiştek an kesek di çirkek de çend metre  çûye.

Heger erebekî, di saetekê de 50 km derbas bike, leza erebeyê 50 km / h:

$$\text{fart} = \frac{50 \text{ km}}{1 \text{ h}} = 50 \text{ km/h}$$






Di hevkêşeya jor de, gava ku em rê bi dem re parve dikin, em leza navin a erebeyê hesap dikin.

Lezdanî pîvanêk ku nîşan dide ka çawa tiştek bi lez diguhere e, mînak erebeyek çiqas zû ji 0-100 km / h de dikare bimeşe. Dema ku leza erebe diguhere, erebe bi lezdanî dimeşe. Ev hem dema ku erebe lez zêde dike hem ji dema ku lez kêm dike têwe. Heke lez zêde bibe, lezgînî erênî ye. Heke erebe leza xwe kêm bike, lezgînî neyînî ye. Lezdanî bi mêtre çirk bi çirk tê pîvandin, an jî m/s2.

## Hesapkirina rê, lez û dem:

Me ji berê ve dît ku em dikarin formula lez ji bo hesapkirina lez bikarbinin.
Heke lez û wext zanibe mirov dikare formula lez di hesapkirina ka çiqas tiştek diherike de jî bikarbine. Heke lez û rê zanibe mirov dikare formula lez di hesapkirina dem da jî bikarbine.

**Rê**

For å regne ut hvor langt noe har beveget seg, kan vi multiplisere fart med tid. Hvis vi vet at en bil har kjørt med farten 80 km/h i 2 timer, kan vi regne ut at veien bilen har beveget seg er 160 km:




**Tid:**

Ji bo hesabkirina ka tiştek çiqas herikîye, em dikarin lez bi dem re bi zerpîn. Heke em dizanin ku erebekî bi leza 80 km / h di di 2 saetan rê çuye em dikarin hesab bikin ku durahîya ku erebe çuye 160 km ye:



# Pirsên li ser nivîsê di derbarê lez û lezdanîyê:

- Ji bo ku em bikarin leza erebeyek hesap bikin dive em çi bi zanin?

Bersivên yek an jî zêdetir hilbijêrin.

  - Erebe çiqas dûr çuye
  - Erebe çiqas dem bikar anîye
  - Erebe çiqas mezin e

- Yekîneya lez çi ye? Bersivên yek an jî zêdetir hilbijêrin.

  - Km/h
  - m/s
  - $m/s^2$

- Lezdanî çi ye? Yek bersiv hilbijêrin.

  - Leza herî mezin ku tiştek dikare here.
  - Yekîneyek pîvandina ka tiştek çiqas bi lez diguhere
  - Tiştek çiqas dûr di meşê

- Yekîneya lezdanî çi ye? Yek bersiv hilbijêrin.

  - m
  - km/h
  - $m/s^2$

- Formula lez ji bo çi tê bikaranîn? Bersivên yek an jî zêdetir hilbijêrin.

  - Lez ê hesap bikin
  - Hesab bike ka tiştek çiqas dûr diçe (rê)
  - Hesabken ka di dirêjahiya demek bi sinor de mirov çiqas dem bikar tîne. (dem)